

## Nîzama Xanî

### **Ji bo dezgeha bajêr ya bo demeke bihurbar ji bo penaberan û bêwaran di Stadt Münsterê de**

Li gorî § 3 bend 4 ya rêznameya Stadt Münsterê ji bo bikaranîna dezgeha bajêr ya ji bo demeke bihurbar ji bo penaberan û bêwaran di 16.12. 2016 de ev nîzama xanî tê derxistin.

#### § 1 Gelemperî

- (1) Stadt Münster dezgehên ji bo demeke bihurbar debar dike ji bo biwarkirina demeke bihurbar ji bo penaber û bêwaran. Ji bo alîkariya xwe wê saziyên azad wezîfedar kir. Rêzname teferuata ji bo bikaranîna malên bihurbar yê bajêr ji bo penaber û bêwaran yê Stadt Münster dirust dike.
- (2) Di dezgehên bajêr yê bihurbar de mirov bi awayekî teng bi hev re dijî. Ev nîzama malê li ser erkên nişteciyên jin û nişteciyên mêr û yê mêvanên jin û mêvanên mêr ahagdar dike.
- (3) Ji bo jiyanke baş ya bi hev re, li cem qayîdeyên nîzama malê, hev û din qebûlkin, rêzgirtina hev û din û alîkarxwazbûn jî pêwîst e.
- (4) Dezgehên bihurbar ne ciyên zordariyê ne. Her awayê zordariya bedenî devkî yan jî ya fizîkî û her awayê biçûkdîtî wê neyên tolere kirin.

#### § 2 Kesên mesûl – Huqûka Xanî

- (1) Stadt Münster û saziyên azad dezgehên bihurbar yê bajêr bi rê ve dibin. Ew muhatabên hemû pirsên ku di derheqa dezgehên bihurbar de ne. Xizmeta civakî û ya malê şêwirmendiya rewa bicîhkirina nişteciyên jin û nişteciyên mêr pêk tîne.
- (2) Karmend qanûna malê pêk tînin. Divê ew pêkanîna nîzama xênî sererast kontrol bikin. Divê nîzama wan were bi cîh kirin.

#### § 3 Nîsbeta bêkaranîne

- (1) Bikaranîna nîsbetî gelemperi ye. Tu mafê kesekî tune ye ku di dezgeha bihurbareke diyar de, di odayên diyar de yan jî di odayên bi awayekî diyar û mezin de were bi cîh kirin.
- (2) Di dezgehên bihurbar de wê ji bo malbatan yan jî ji bo kesên bi tenê yê ji eynî cînsî ne cîyê mayîne yê rewa were dayîn. Mafên kesên bi tenê tune ku bi tenê di odayekê de werin bi cîh kirin.
- (3) Kesên bikaranînen mafdar dikarin ji bo sedemên rast her dem ji bo dezgehên bihurbar yê dinê werin şandin. Mafê bikaranîna malê dikare were betal kirin. Rêzname bajarê Münsterê teferuata bikaranîna dezgehên bihurbar yê bajêr yê ji bo penaberan û bêwaran bi rêk û pêk dike.

#### § 4 Mafê Şêwirmendiyê

Xizmetdarên Stadt Münster û karmendên saziyên azad dikarin têkevin hemû odeyan saziyan û mekanan:

- di rojên kar de di navbera saet 7 û 8 de piştî xeberdana di demê de û ger sedemên ras hebin (w.N. Tadîlat, kontrolkirina rewşê, xwendina alavên pîvanê), pêwîst be bi karkerên jin û karkerên mêr ve.
- Her dem di xetera berbiçav de.

#### § 5 Cîh û war

- (1) Odeyên ku tên dayîn tenê ji bo kesên ku şandine wê derê û tenê ji bo jiyane divê werin bikar anîn. Heywan xwedîkirin qedexe ye.
- (2) Nişteciyên jin û yên mêr divê qîmeta odeyên ku dane wan û ferefolê ku dane wan bizanibin. Divê tu parçeyek mobîlya jî odeyan yan ji odeyên ji bo her kesî û alavên elektronîk neyên derxistin û ne ji werin guhartin. Mobîlya xwe bixe re anîn û alavên elektronîk û danîna wan bi rastî jî ne cayîz e. Li ser îstîsnayan rêvebiriya wê dezgehê biryarê dide.
- (3) Destûr tune ku nişteciyên jin û yên mêr satelîtan di dezgehên ji bo demeke bihurbar de daynin yan jî wan bi diwar ve monte bikin. Xwestina kişandina kabloyê telefonê û îcaze ji bo serîlêdanê wê jî tune.
- (4) Nişteciyên jin û yên mêr nikarin tu guhartinekê di dezgehên ji bo meke bihurbar de pêk bînin.
- (5) Nişteciyên jin û yên mêr divê ji bo germkirin û hewadarkirina asayî ya odeyên ku di dezgehên ji bo demeke bihurbar de dane wan hewil bidin.
- (6) Ciyên ku ji bo herkesî ne dikarin bi lihevkirina Stadt Münster re ji bo projeyên bi rûmet werin bi kar anîn.

#### § 6 Ewlehî

- (1) Kesên ku di dezgehên ji demeke bihurbar de dijîn yan jî yên ku tên serdana wan, ji bo sedemên ewlehiyê divê her dem pêşiya wan vala bihêle:
  - hemû pencere û derî, salon, derence û çardaxan,
  - riyên rizgarkirinê û yên bazdanê, riyên tirêmbêlên îtfayeyê û riyên ji bo ketina nava xanî, riya kîlerê, odeyên zûha û yên cilşuştinê, divê ne weke ciyên xirad lêdanîne yan jî weke depo neyên bikar anîn. Xiradên bêdestûr li wan deran hatibin danîn wê ji aliyê karmendên jin yan jî yên mêr bê ji we re gotin wê ji wê derê werin dûrxistin.
- (2) Divê qaîdeyên gelemperî yên pêşî li agirgirtinê werin ber bi çav kirin. Lampa vekirî û Agirê vekirî ne cîz e. Tiştên bi xeter û yên werin teqandin û agir pê dikeve divê di saziyên ji bo demeke bihurbar de neyên bicîh kirin. Agirkuj û alavên agirpêketinê diyar dikin divê tenê di dema agirpêketinê de werin bikar anîn.
- (3) Nexweşiyên ku divê gori §§ 6 û 34 ya qanûna xwe ji infeksiyonê parastin (§§ 6 und 4 Infektionsschutzgesetz) divê ji aliyên yên ku nexweş in yan jî ji aliyên niştecihên jin yan jî yên mêr ve yên pê dihesin di heman demê de ji xizmetdarên sosyalê re yan jî yên xizmetdarên malê re werin gotin. Hinek ji nexweşiyên ku divê werin gotin nexweşiya

kulêra, difterî, hepatîtis, sipî ketina serî, sorik, menenjît, bergûh, pertusîs, weba, mîrkutok, harbûn, tîfo, yan jî jana jirav.

- (4) Di dezgehên ji bo demeke bihurbar de kişandina cigarê bi temamî qedexe ye. Yê ku di dezgehê de cigarê bikêşîne divê ew bi cezaya peran bihesibîne.

#### § 7. Nîzamnâme

- (1) Nişteciyan jin û yên mêr divên aşitiya malê biparêzin û ji hev û din re îhtiramê bigrin. Divê dev ji teqereqa ku aramiyê xirab dike di her dema rojê û ya şevê de were berdan. Aramiya şevê ji saet 22 heta saet 7 divê were pêk anîn.
- (2) Kesên ku ji bo wê derê nehatiye şandin dikarin tenê ji saet 7 heta saet 22 di dezgehên ji bo demke bihurbar de yan jî di ciyê ku bi wê ve girêdayî ye de bisekinin.
- (3) Kirina karekî bazirganî yan jî yê karekî serbest, bi çî awayî dibe bila bibe, ne di dezgehên ji bo demeke bihurbar de û ne jî li ser ciyê ku bi wê ve girêdayî de cayîz e.
- (4) Makînen cil şuştinê û yên cil zûha kirinê divê tenê ji aliyê nişteciyan jin û yên mêr yên di dezgehên ji bo demeke bihurbar de tenê ji bo cil pakijkirina cilên xwe werin bikar anîn. Divê rêbera bikaranîna alavan bê şert û merc were pêk anîn. Divê kapasîta alavan were ber bi çav kirin û were bikar anîn.
- (5) Av divê tenê ji bo îhtiyaca malê û ji bo pakijkirina dezgeha ji bo demeke bihurbar were bikar anîn. Bi taybetî jî ji bo şuştina xalîçeyan destûr tune. Ji bo temîzkirina xalîçeyan xizmetdarên malê yên dezgehên ji bo demeke bihurbar makînen ku şiliya xalîçeyan dikêşîne didin we.
- (6) Xwedîbûna çekê yan jî bi xwe re gerandina silehê yên bi her awayî yan jî derbên wan di dezgehên ji bo demeke bihurbar de qedexe ye. Xwedîbûna wan yan jî bi xwe re gerandina lîstokan yên weke sileha ne yan jî weke derbên wanin, yên ku weke silehên rast û derbên wan yên rast xuya dikin û ji aliyên kesekî din ve weke ew rast bin tîn dîtin qedexe ne.

#### § 8 Paqijî

- (1) Nişteciyan jin û yên mêr yên dezgehên ji bo demeke bihurbar divê wê gorî nîzamê paqij bikin.
- (2) Zibala malê divê ji hev were cûda kirin û di satilên zibalê yên li ber dest de ne were tune kirin. Beriya tunekirina zibala taybet ji xizmetdarên malê bipirsin.
- (3) Xiradên mezin divê tenê di dema birina xiradên mezin ji aliyê şirketa zibalê ve ya Stadt Münster li kêleka rê were danîn. Gemariya ku li yan jî li ba dezgehên ji bo demeke bihurbar divê ji aliyê yê yan jî ya ku ew pêk anîye ve were paqij kirin. Eger ew wê nekin, karmendên bajarê Hannoverê yan jî karmendên sazîyên azad wê li ser hesabê wî kesê ku sedem daye wê gemarê bide paqij kirin.

- (4) Zibala malê û ya pêjgehê û her wiha xiradên dinê divê ne di tuwalêtan, destşokan duşan yan jî di hewdikê serşokê de were tune kirin.
- (5) Arav divê tenê di ciyê ku av tê de tê rijandin yê ber destan de were rijandin lê belê divê ne li derve were rijandin.

#### § 9 Tirêmbêl

- (1) Tiêmbêl dikarin tenê li ser cîhê dezgehên ji bo demeke bihurbar tenê li ser ciyên parkan yan jî ji bo vê armancê ciyên ku hatine nîşankirin werin sekinandin. Ciyên parkê yê ku ji bo karmendan hatiye nîşan kirin tenê dikarin karmendên Stadt Münster yan jî yê sazîyên azad werin bikar anîn.
- (2) Tenê tirêmbêlên ku ji bo tirafîkê hatine qeyid kirin dikarin li ser ciyên dezgehên ji bo demeke bihurbar werin sekinandin.
- (3) Tirêmbêlên ku dijberî qanûnê li wir hatine sekinandin wê li ser hesabê xwedana wê yan ji yê xwedanê wê were kişandin.
- (4) Li ser ciyên dezgehên ji bo demeke bihurbar rûnê tirêmbêlan guhartin û tamîr kirina tirêmbilan û şûştina wan ne caîz e.

#### § 10 Barkirin

- (1) Nişteciyên jin yan jî nişteciyên mêr yê dezgeheke ji bo demeke bihurbar mala xwe bar bikin û herin, divê ew Stadt Münsterê yan jî Hausdienst (xizmetdarê malê) di dest de - beriya çûyînê – yan bi devkî yan jî bi niviskî agahdar bikin. Kilfê yan jî xiradên ku ji bo wan ji bo demeka bihurbar hatine dayîn divê beriya mal barkirinê şûnda were dayîn.
- (2) Eger di malekê de ji heyvekê zêdetir bê îcaze nejê jiyandin, mafê Stadt Münster heye ku wê vala bike. Mesrefê veşartina alavên malê û xiradên şexsî divê xwediyê wan yê nişteciya yan jî nişteciyê wê malê bû bide, û mesrefê ji bo kilfê dewsoke jî.
- (3) Stadt Münster bi niviskî diyar dîke ku ew xiradên hatine veşartin di demeke diyar de werin birin. Eger ev pêk neyê, mafê Stadt Münster heye van xiradan li mezatê bifroşe. Eger ciyê nişteciyê jin yan jî yê nişteciyên mêr ne diyar be, heqê Stadt Münster, piştî sê heyvan piştî valakirina malê, ew xiradên ku veşartine wan li mezatê bifroşe. Xiradên ku diyarin ji tiştê re nabin yan jî bê qîmet in, di heman demê de tên tune kirin